الپارتي P.D.K.S 1957
الحزب الديمقراطي الكردي في سوريا

# DENGÊ KURD

10 gelawêj 2713 k 1-9-2013 z DENGê KURD -hjmar (15) www. Pdksp.com

# sêmalka pira rizgarbûnê biberû beheştê ve



## Sêmalka

Pira sêmalka … pira çîrokên şîrkuştî..pira derd û êş û azaran ..pira siratê..pira têperbûnê ji dojehê biberû beheştê ve ..sêmalka sirata ruhabûnê..sêmalka rizgarbûn ji sitem û sitemkariyê..ji birçîbûn û tîbûnê..sêmalka pira jiyanê..rizgarbûn ji mirinê.Rojavayê Kurdistanê ketiye ber çama rûreşiyê û xiniziyê ji bal dorpêçana birayêin dijimin û zikreş..ew birayên ku partîxwazî kirine berjewendiya sereki di karûbarê welat parêzî û netewperwerî de Sêmalka wêstgehke dîrokiye di hemû wata û çemk û naverokan de. Sêmalka dema ku şivan dibe gurê keryê pez.


2 « Kongireyê kurdewariyê di hilêban de çi lê hat

2 « Civînên Partî û (PYD) ê armanc û hêvî

3 « fit û fitan û fit? çîroka pendekê

3 « Qereçox çiyayê dastan û omêdan


www.arsivakurd.org

# Kongireyê kurdewariyê di hilêban de çi lê hat

**şêrzad osman**

Kongireyê Hizr û ramana bestina kongirê kurdewarî bi rastî şakarekî dîrokiye di terazûya helsengandinê de li hemû war û biyafan deimkî vehewandina part û alîgirên tevgera rizgarîxwaza Kurdistanê ji her çar parçeyan ne karekî hêsane ji bilî kongireyekî giştî û komsar,hemû kurd têde dicivin û hemû babet û mijarên peywendîdar û pabend bi kêşdoza kurd ve tên guftûgokirin û gengeşekirin bi giyanîkî birane û bê hilêbin partîxwazî ji ber ku serdem û rewş zor nazik û hestyare, ji ber ku gel pêwîstî yekîtiyeke rasteqîneye da ku rawste li himberî helmetên komerîşkên çekdar yên Erebî yên berberî tekfîrî ewên ku rojavayê kurdistanê dane ber çama reş û dixwazin herêma rojava têkbidin û dîmografyaya wê bigorin. Li vê derê li himberî du tênerîn û sê rehndan rawestiyane.

1- kurd pêwistî stratîciyeke serbest û serdestin û dînamîxwazin ji ber ku bûyer û qewmanên dîrokî û siyasî peyapey hevdû dikşînin bi ber û encamin çarenûsaz.

2- kurd pêwîstî yekîtiyeke kurdewarî rasteqîne ne da ku li himberî ewê helmeta regezperstî Erebî şofînî tekfîrî rawestin ji ber vê yekê di nê hemû bercewndiyên kesokî û partîxwazî bidin alî û dakokiyan mukumbikin û nakokiyan kêm û labidin ji ber ku têk çûna Kurdistanê ango têkçûna kêşedozê ye û wisa herkes û hertişt têkdiçe û wê gavê nakokî û dakokî dibin kelemperk li ber bayê xiniziyê û li ber bayê sawêr û lorînkan neqerîskan vedilîzin.

Sêrehend.. kongireyê kurdewarî da ku serrast û tekûz bibe divêtin di evan hersê rehendên pevxistî û tevxistî re derbasbibe.

1- pevxistin û tevxistina mala kurdî li her perçeykî bi serê xwe da ku nakokiyên navxweyî bi meillsin û bi çelmisin û ji dêvlî wan kar û xebata hevbeş dakeve gorepana tevgera rizgarîxwaz.

2- pênasîna her perçeyekî ji her çar perçeyan gîrûgirift û nakokiyên parçeyên dîtir û di rêya gengeşe û guftûgoyan de le yektir bi hevra çareseriyan li darxînin bi giyanekî kurdewarî serbestxwaz.

3- Pênasîn bi siyaseta navherêmî û bazra siyasî ya navnetewî da ku nerîn û tênerîn û rehend û mafkêşanên welatparêzî û netewperwerî li hev bi guncin û li hev derkevin da ku sitraticiya ya kurdewarî Bi gihêhje armanc û serseda serxwebûnê û kurdistana azad. Paşî evê berahîka nasyarî û şirovesaziya siyasî bi bingehkirina naverokê digel nerîn û tênerîn û rehendên navnîşankirî em dikarin bibêjin ku kurd û tevgera rêzgarîxwaz û kongireyê kurdewarî mifa û sûdê dê wergire ji pêrgîn û civîn û civat û hevpeyvînên destbidar û destlikar da ku rûberûna dijminan serbest û serdest li darkeve.



# Civînên Partî û ( PYD ) ê armanc û hêvî

**M.EmînSadûn**

**xeleka (2)**

Me di xeleka yekimîn de daxuyakirin, ku gelek alî û hêz wê ji encamên erênîyên civînên di navbera (Partî) û (PYD)ê de dilgiranbibin û hindî wê bi tirs lê binêrin, û hindî tir wês piştevaniya wê çiraste xwûyan veşartî bikin. nexasim ku di demabê de herdu alîber bi hev diçin ku hevpeymaneke istiratîcî morbikin. ew hêz û alî wê ne razîbûna xwe di bin armanc û hêviyên mezin de eşkere bikin.jibr aliyên têkildardi vê hevpeymanê de, çiyên dûrya njêyên nêzîk,ne veşartiye ku hin ji wana mifadarin û hin jê zerarmendin, û hin dîtir xudan berjewendî û helwestin, û ew alî jî wek me dane xuyakirin evin : gelê kurd li Rojavayê Kurdistanê , çavdêr û zêrevanên siyasî , Elewî (rêjîma Sûriyê) ,Partiyên kurdî , Suna(Rikberiya Sûriyê) , hêzên nêvdewletî û herêmî. ka her yek ji wana çi dixwaze û di derbarê vê hevpeymana istiratîcîk de wê çi bibêjin û herwiha wê çawe li encamên van civînan binêrin û helwestên xwede rxînin. Me di xeleka borî de xwestekên gelê kurd û xwendina çavdêrên siyasî derbarê vê hevpeymanê de diyarkir. Lê ka rêjîma Baas wê çawe li wê hevpeymanê vegerîne û bersivê bide. Di baweriya me de rêjîma Baas gihaye wê bawereyê ku nema êdî dikare rewşa Sûriyê ve gerîne qonaxa berî şoreşê, û nikare bi rengê berê bi darê zorê û bi kotekî serdestyê li gelê Sûriyê bike .ew gihaye wê hizrê û karûbarên xwe dike û li piştî çûnê difikire, û bi taybetî li çarenûsa Elewiyan piştî têkbirina rêjîmê digere .eger em gihabin wê baweriyê ku rêjîm wisa tevdigere û li gorî wê yekê dixebite,emê bawerbikin ne xwe îro ev hevpeymana istratîcî,erê niha ne bi rengekê yekser di berjewendiya Elewiyan de ye, û eger ew ne kêfxweş û piştrast bin jê jî, lê wê ta radeyekî ne dijî wê jî bin ,ev yeke jî jiber van çend xalên jêrên:

*Elewî dizanin kurd hêza bi tenêne di hindurê Sûriya paşerojê de,ku dikarin bi hêlin Elewî û suna li sermaseyekî bi hev re bicivin ,û eger kurd bi vê rolê ranebin û di nav bera herdu aliyan de nerûnin, wê tu carî herdu alî bi tena xwe ni karibin li he vbicivin û baweriyê bi hevbînin.

*Elewî û kurd bi hev re ji serdestî û hişkiya aliyên suna di Sûriya paşerojê de ditirsin ,û bi taybetî tirsa wana ji hêzên tundrew û radîkal û pêlên wan yên dijber û dijwar -jiber ku ev hevpeyman di bin çavdêriya rêzdar Mesûd Barzanî de tê avakirin. Bê guman Evyeke wê bi helê pira di nav bera Elewî û lê vegera wan de ku rêjîma Iranêye wê bimîne vekirî, yan wê di dema bê de bi hêsanî bê vekirin.

* rêzdar Mesûd Barzanî wek kesayetiyek xwedan rol û cihgirtî di hevkêşa herêmî , nêv dewletî û nav netewî de ,ku em dikarin bêjin rêber û serokê bi tenêye di herêmê de îro helwesta wî cudaye ji ya rêber û serokên dewletên cîranên Sûriyê, kutêkilî û peywendiyên wî yên baş û berçav bi Rûsiya , Iran , Ewropa û Emerîka re hene û ew tavê kêlîkê Rûsya û Iranê dibîne aliyên çareseriyê ji çareser kirina qeyrana Sûriyê re. ne wek rêber û serokên dewletên dî ku di bînin Rûsyaû Iran bûne alî di pirsgirêka Sûriyê de . ev helwesta he ya zelal rehetî û dilxweşiyê bi Elewiyan re çêdike û wan ber bi xwe ve dikişîne .ji ber van egerên raborî em guman dikin ku rêjîm yan Elewî wê li dûv vê hevpeymanê bin û astengan jê re peydabikin ,lê wê bi temamî ne dijî wê bisekinin. Partiyên kurdî bitirs li vê hevpeymana istratîcî dinêrîn û tirsa wan jî ji wê yekêtê ku eger ew hevpeyman hate morkirin wê rola wan di bizav û çalakiyên kurdewarî de nemîne ,ji ber piraniya wan partiyan wek miletê kurd dizane şert û mercên avakirina rêxistinî di wan de peyda nabe, wan ew bingehê cemawerî û gelêrî di nav milet de nîne,ku li serkar û xebatax we bi rêvebibin.her kes dizane tenê ew partî bûn xwedan rol,cih,nav û deng li ser nakokî, cudabûn, newek hevî û tevilheviya di nav partiyên serekî de û îro ji çavkaniya wan nakokiyan hebûn û berdewamiya xwe distînin û dibin xwedan helwest û bandor .dema ev hevpeyman bê morkirin, li virti rola wan partiyan namîne, jiber vê yekê jî wê nerazî bûna xwe bidin xuya kirin û wê binêrîn û helwestin har û dijwar şerê wê jî bikin .

Bêguman rekberiya Sûriyê wê nerazî be ji vê hevpeymana isrtatîcî, ew tu carî naxwazin kurd bibin hêzek xurt û xwedan helwestek cuda û taybet, jiber ew ji mafên kurdan yê rewa û dadmend direvin û herweha ji daxwaz û xwestekên wan jî ditrsin. dixwazin kurd parçeparçebin û hêzên kurdî berdin hev û sûdê ji cudabûn û parçebûna wan bibînin , herdemî aliyekî ji wana bigirin û berdin aliyê dî .di vê derarê de zêrevanên siyasî guman dikin ku tevî îro ( PYD)ê û rikberiya Erebî dijberiya hevdikin û nelihevin , lê di dema bê de ne dû re herdu alî li himberî daxwaza fîdraliyetê rawestin , jiber daxwazên ( PYD )ê ne dûrîbîr û boçûnên wane di derbarê kêşa kurdî de , ew jî wê ne dijî xweseriya Demoqratîk bin li deverên kurdî li Sûriyê,û wek tê dîtin hemû aliyên rikberiyê vê daxwazê qebûl dikin .lê li aliyê dî geşbûn û serketina hêzên misilmanên sunamîna Ixwanmuslimîn û heval bendên wan li rojhilata naverast û bakurî Efrîqiya tirsek mezin li cem Ewropa , Israîl û Emerîka peyda kir û ew hêzketin wan baweriya ku dema ew hêzên Misilman di paşerojê de ku bingeha nêrînên wan yeke û di de mabê de hev bigirin ,yekbûn û hevgirtina wan wê li dijî berjewendiyên wan hêzan yên aborî û têkiliyên wan yênsiyasî û dîplomasî derkeve ,ji ber vê yekê jî ew hêzên mezin naxwazin aliyên suna li rojhilata naverast weku hêzeka taybet û serbixwe xurt bibin û hevbigirin, her weha tirsa ji wana wê ew hêzne xwazin neyarên wana wekî ro tênê naskirin bi şîia û lêvegera wê Irane,bi temamî ne hêlin û wan tune bikin, tevî ku dibe wan jiber berjewendiyên xwe ta astekî lawaz bikin,lê em bawer nakin ku wan ji binîve rakin û biherifînin,jiber kurd îro hêzeka ne metirsîdarin li Herêmê wek herdu hêzên hevrikyên navbirî,jiber wê jî avakirina hevpeyma neke istiratîcî di navbera duPartiyên kurdîyên serekî de û bi çavdêriya serokê Herêma kurdistanê rêzdar Mesod Berzabnî,bê guman wê cihê pîrozbahî û piştevaniyê be li cem wan hêzên nêvdewletî û herêmî . nexasim em jibîrnekin ku ew hevpeymana Istratîcîya ku di navbera ( PDK) û (YNK )ê de li başûrê kurdistanê bi pîrozbahiya Emerîka û hevalbendên wê hate avakirin û her wan piştevaniyawêkirin û ta vê kêlîkê jî alîkar û piştgirin jê re .

www.arsivakurd.org

# Qereçox çiyayê dastan û omêdan

Îsa mîranî



Çiyayê qerecox beşek ji zincîra ciyayê bêxêre ji rûjhilatê ava mezin(dicle) vedkişî bi aliyê rûjava li bara gundê pêşabûrê bi rûbarê dicle tê birîn
Qereçox bi tevaya xwe dikeve kurdistana rûj ava sînûrê wê ji rûjhilat rûbarê dicle û kendalê tûremêşa
Rûj ava xana serê û çiyakê şêxê dîn
Bakur deşta hesina
başûr deşta bakur ya çiyaye şingalê
Bilindiya wê ji derya 779mitre navê wê ji du gotina pêktê(qere):reş û( çox): gelek angû çiyayê gelek reş û bingehê vê gotnê turkiye û dever bi tevaya xwe vûlqaniye kevir reşin xak sore pêzanînê zanistî li ser deverê gelek kêmin lê pêzanînê devikî gelek hene ji bav û kala hatine wergirtin
Tê gotin çiyayê qereçox bi tevaya xwe daristanek serûştî bû bara bihtir ji darê wê ev cûre bûn1-berû
2-kezwan
3-çilû li aliyê bakur gelek darê fêkî hebûn lê bi egerê birîna hovane û çêrandina sewala darê serûştî lê neman jibilî dû dare berwa temenê wan gelek mezine ewjî bi egerê bawerînê ayînî û gelerî man yek li ser kûpê çiyêye nave wê dara keçikêye û ya dî li alyê bakure navê wê dara kurikelawik- û li dora wê dare şînwarê bajarek dîrokî heye nave wê bajarê kurike-lawikû li ser va herdû dara dastanek evînî tê gûtin binavê dastana kurik û keçikê "Dibêjin" lawik nave wî kurkê ruyale lê keçik bê nave û di Kevin tevna evîna zor û bi egerin civakî dorî hev dikevin û ji ber hev wenda dibin lê lawik sozê dide cane xwe kû li male ne zivire heya evîna dilê xwe nebîne û piştî demek dirêj hev dibinin keçik li ser kûpê qereçox û kurik li binya nizara bakur ber hev di bezin lê berî bighin hev ji eşqa evîna resen herdû dimirin û cihê wan du dar şindibin yek navê wê dara keçikê û ya dî dara kurike û herdû muqabilî hevin û bûne cihê bawerînê gelerî wek darê Mirada heçî miradek ya wan hebê û bê hevî bimîne qesta wan dara dike û paçekî peva girêdiden û bendewarê wê hîviyê di mînin û ew omêde hin tendurstîne û hin evînîne û hin jibo anîna zarokane
Gelek êl û hoz û eşîra li wê deverê danîne û pirania wan lê nemane jbilî êla koçerê mîran pê zanînê devikî di bêjin êla herî mêjoyî lê danî êla misûsanane ew jî êlek ji êlê êzidiyane û heta îro di bêjin Qereçoxê misûsana gelek war û gund bi nave wan hene wek - ware reşika - bîra sêvo - xatir can - bîra rûvî 1– qepo
2-êla şikaka ewjî demek dirêj lê mane û heta îro şînwarê konê Himze begê şikakî li ser girê himamoka xwyaye û nave gund îro Himze bege
Nayifê paşê serokê êla koçerê miran wek rêz girtinek taybet her sal pargînê konê wî nû dikirin jibo şînwarê wî wenda nebin û piştî barkirina şikaka hinek ji wan man û nave wan kirin ga westyayê şikaka û piştra bûn beşek ji êla koçerê miran îro nave wan Berzerîne
3- êla koçrê mîran piştî van herdû êla bi egerê koçerîtiye lê danîne û sewalê xwe lê çerandine û piştî şoreşa şex seîdê pîran 1925 lê akincî bûne û gelek gund avakirin wek beroj û gir Kendal û himze beg û dehê gunda li bakur û başûrê çiyê avakiin dema misûsana lê danîn dibêjin şerek giran û dastanî di nêbena wan û êla kîkan da hat pêxistin û divî şerî da sê mêrxas hatin naskirin heta îro nave wan di sitranê gelerî da tê gotin ew jî Bozê zerî û Xişmanê heyder û Hovkê misûsaniye
Ji alyê samanê seruştî va devera Qereçûx gelek dewlemend û zengîne îro buye jê derk giring ji abûra dewleta sorî ji alyê petrol û berhemê çandin û giyanewera te zanîn kû devera qereçox yeke mîn dever bo ji alyê ditna petrolê li sûryê
dîtin u kolan û berhem ji alyê companya menhel ya elmanî bû di sale pênciya ji çerxe bistan
Sala 2000 rijêma sûryê gelek dar lê çandin û kirin dehl û devî û daristan û bû jîngehek serûştî jiber gelek tewal û balind û giyanewer lê êwirîn û ew jîngihe bû cihê dawet û seyrana naxasim her çend heyvên buharê lê mixabin va her çend sale dûmahyê guhdan lê kêm bûye ji alyê rijêmê û gelek dest dirêjî li ser tên kirin wek çêrandin û birîn û şewat û dizên şînwara

# fît û fîtan û fît ?

## çîroka pendekê

mihemed emin erefat



Weke her mirov dema yek bi vê rewşa ku îro em têre derbas dibin di ramin , sed raman di sere mirov de diçin û tên , kes nizane berê me û vî welatî bi kûde ye , ev tevgerin tundrew yên ketin herêmê de em nizanin bo çi ji şamê qerane û berê xwe dane herêma rojavayê kurdistanê ,bi vê sergêjiya giran penda kurdî ya kevnar hate bîra min , ew pend ku di dibêje: (HEGER KER GIHA MIN JI XWE FÎT , Û HEGER KER Û JIN JÎ GIHAN MIN JI XWE FÎÎÎÎTAN ÛFÎÎÎT ) Ev pendek kurdî ya kevnare , ez pê agahdar bûbûm , lê min ne dizanî çîroka vê pendê çiye ta rojekê kalemêrekî weha ji min re got : ligundekî ji gundên kurdan ciwanmêrek ew , û hevsera xwe , û zarokên xwe dijiyan , rojekê ciwanmêr û hevsera xwe dixwestin herin bajêr , da hin kinc û minc û hin xwarin marin ji xwere bînin , serê sibê hîn rokê nedabû der berê xwe dane bajêr , hevsera xwe li kerî siwar kir , û ber bi rêde çûn ,demeke ne dirêj çû ,herdû ji xwere di axvîn ji dûrve kalemêrek dîtin nêzî wî kalî bûn , silaf lê kirn û bi hevre rêka xwe berdewam kirin , ciwanmêr ji hevsera xwer got : jina hêja çiqas baş bû ku tu bihata xwar, û ciyê xwe bidana vî kalemêrî, jina delal gotina hevserê xwe ne şikand û ji ser pişta kerî xwe avête xwar , û kalê bi temen hildane ser pişta kerî û rêka xwe berdewam kirin . Piştî demeke baş gihiştin bajêr û ketin bazarxana bajêr de , lê ji nişkêve kalemêr dengê xwe hilda û got : gelî mirovan gelî ciwanmêran ev mirov ketiye devê rê ya min û dixwaze kerê min ji min bisitîne , ciwanmêr matmayî ma bi cî yê xwede , û nema dizanî çi bêje , mirov lê gihan hev , û dijûnî wî kirin , kalemêrê şeytan berdewam kir û got : ev mirovê hov çunkî min dibîne kalekî bê xwedî dixwaze kerê min ji min bistîne , ciwan mêr da ber sûnda lê tu encama sûnda nebû , kalemêr berdewam kir û got: ez bi xwedakin wê niha bêje ev hevser jî ya mine ,ciwan mêr her da ber sûnda lê kî wê ji wî bawer bike , di wê demê asayîş hatin , û bi qemçûra wan girtin û ew xistin zindanê , ta qazî çareserîkê di nav bera wan de bi bîne . bû evar û qazî bi çîroka wan agehdar bû , qazî ferman da ku her yek ji wan têkeve zindaneke cuda de , qazî gelek jîr û jêhatî bû ,di xwest ji dizîve li wan agadarî bike , da bi zanibe her yek ji wan bi çi di rame , di derengî şevê de çû ber deriyê zindana ciwan mêr da bi bihîze ka wê çi bêje , dema guhên xwe nêz kirin , ciwan mêr di zindanê de ji xwere di got : ax û sed carî ax eve ddomhîka qenciyê , min ew li kerê xwe siwar kir , lê wî bê bextî ev anî serê min . Qazî got ; min ya te hiskir lê kalemêr çi di bêje ?! Berê xwe da ber dergehê gale mêr , û guh dayê ji dizî ve bê ka kalo wê çi bêje ? kalo ji xwere di got ; bi xwedê heger ker ji min re ma ji xwe fît , lê heger ker û jin jî ji min re man ji xwe fîtan û fît . qazî ji xwere got ez bi xewda kim ev kalekî şeytane . Roja din qazî ciwanmêr û hevsera wî berdan û kalê şeytan hişte di zindanê de da ji herkesîre bibe nimûne . Eve çîroka vê pendê çîroka hemû dem û çaxaye , çîroka me kurda bi dijminê mere , ku her û her em bi qenciyê û biratiyê di çine wan , lê ew bi xap fetla têne me , û di her demêde ew me di xapînin , û di her demê de em hiş û swedan nagirin ji ser pêhatiyên xwe , her ew dixazin me û jinên me û zarokên me ji xwere bikin xulam û xatûn , ew ji xwere di bêjin ; heger qada kurda bi me ma ji xwe fît û heger qada wa û jinên wan jî jimere man ji xwe fîîîtan û fîîîîîîîîîîîîît. Lê ka em li kûne ji vê tiştê ? emê kengî bibin yek ta kes qada me û keçên me ji xwere nebin? heger em nebin yeke bê goman ev şepolên tundrew we vê pendê li ser me bikar bînin û ya dî ez ji were dihêlim ka çi wê biserê kurda wê bê kirin ?.

www.arsivakurd.org

# ahê dil mirî

meysera derwîş

Heyî sitemkarê bê ol
Xwîn xwarê çav sor
Te çi divê ji vî miletê birîndar
Heyî hovê li ber siye guran
Îro tu li ku mayî ka ew ceberûtê wek kevir
Çi ma diherfe ew kelh
Neman li dorate ji bilî hirç û rovî
Û her tu dibêjî ezim
Şahê tucar nakevî
Te miletek ji hev belakir
Hin kuştin hin birîndarkirin
Te hin di zindanêde windakirin
Hin bi çola xistin, bê cih û war kirin
Te miletek di welatde kire sed parçe
Ma te nizanî wê her parçek bibê çirûskek ji agir…
Te nizanî wê biherfe ew kelha zîv û zêr
Hey hovê bê mêjî te çi divê ji wî kursî
Îro buye bi deh serî, va tu dimrê mirineke hêdî hêdî
Û li dewsa te ava dibê komareke kurdî erebî
Tê de nîne cihê rêjîmeke behsî şofînî





## Ji gotinên berê (pendên kurdî)

Elî reşid

- Ne gundê bê rez ne konê bê pez û ne mieovê dibê ez û ez.
- Heta xewdê li me pirsê kefenê mê rizî .
- Nû hatin Kevin xelatin.
- War ew ware lê bihar ne ew bihare.
- Dostê te ewe ê ko te bigirêne ne ê te bi kenîne.
- Dijmine bav nabe dostê law.
- Mere bi dû jine dergevane.

## Karê pêxwas

# Em carcaran ezmûnan li ber findan dikin

ger em ser zehmetiyan rawestin emê nasbikin ezmûna pêşketinê êdî çiqas bawerî û kar jêre gereke. Peymangeh ji demjimêr 9ê sibehan ta 8ê êvarê vekirye, divê demê de navberek 2 demjimêr hene ji 1 ta 3ê nîvro. Di seranserî rojê de nêzîkî 15 komikan fêrî ziman dike bi hemî temenan (qîz û lawik).Jiber tengahiya cih 10 komik rawestiyane ta ku pirsgirêka cih çareserbibe, herwiha pirtûkxaneyek ku hemî pirtûkê girêdayî dîrok, wêje, çand, û ziman amedeye ewjî ji ber pirsgirêka cih li derveyî peymangehêye. Ji wan zehmetiyan birrîna kehrebê, carcaran ezmûnan li ber findan dikin, tevî van zehmetiyan jî hem şagirt û hem mamoste bi dilekî fereh berdewam dikin. Rêvebirê peymangehê (M.EMÎN SEDÛN B.ŞÊRÎN) ser zehmetiyan wiha got: Tev zehmetiyên pir, yê ku di riya mede wek kelema dirawestin, lê em hin bihin wan çareser dikin; weku pirsgirêka cih, birrîna kehrebê. Yan jî peydakirina alavên teknîkî bo fêrkirnek rewa û pêşketî). Ji bilî fêrkirna zimanê kurdî jî peymangehê korsên tenduristî vekirin û 350 kes jê derçûn.Û korseyek ragihandinê vekirin, 20 rojan dirêjkir, û bidehan jê derçûn. Û herwiha gelek simînar bo ziman li darxistin…HTD Di dawiyê de mamosteyan hêviyê BEDIRXAN anîn ziman ku em dixazin û dixebitin ku em bingehek zanistî avakin di pêşerojê de.



www.arsivakurd.org